



# NEXŞEYA ZIMANÎ YA ERDNÎGARÊ Û NIRXANDINEKE MÎKROTOPONOMİK LI SER GUNDÊ QOPIZA JORÎN (Linguistic Map of Geography and A Microtoponomic Study on the Village of Yukarıkopuz)

Ömer DELİKAYA<sup>1</sup>

---

## Kurte

Ev nivîsar lê dixebite ku bi kurtasî toponomiyê pênase bike û pêwendiya wê ya ligel çend faktorên din yê wekî ziman, dîrok, zanista siyasetê, bîra hevpar û polîtîkayên cihwarnavan (*placenames*) yê desthilatdariyê nîqaş bike. Navên toponomîk beşeke muhim ya kelepûr û bîra hevpar ya neteweyekê pêk tînin. Wekî binbeşeke toponomiyê, mîkrotoponomî navên erdnîgarî yê biçûktir lê dikole, bo nimûne, navên dehl, newal, gir, çiya, kaniyan.

Di pêwenda navên mîkrotoponomîk de yê li Gundê Qopiza Jorîn (navê fermî: *Yukarıkopuz*) a ku li ser navçeya Zêtkaya Agiriyê ve ye, ev xebat piştî di derbarê paşxaneya guherîna cihwarnavên kurdî yê li Tirkîyê de zanyariyên gelemper berpêş dike, bi bergeheke zimannasiyê ve, navên mîkrotoponomîk yê herêmi raber dike û hewl dide çend navên berhevkerî yê bi kurdiya kurmancî ku dikarin wekî termên erdnîgarî bêne nixandin, berçav bike.

**Peyvên Sereke:** cihwarnav; mîkrotoponomî; Kurdiya kurmancî; polîtîkayên zimên; Qopiza Jorîn; Eleşkirt.

## Abstract

This paper aims to describe toponymy briefly, and then discuss toponymic names and their the relationship with several other factors such as language, history, political science, collective memory, placename policies of authority.

---

<sup>1</sup> Bingöl Üniversitesi, Yaşayan Diller Enstitüsü, Araştırma Görevlisi

Toponomic names indicate an important part of a nation's collective memory and cultural heritage. As a subfield toponymy, microtoponymy investigate names of smaller geographical entities such as field names and names of woods, valleys, hills, mounts, springs and so on.

In the context of microtoponomic placenames in the village of Qopiza Jorîn (official name: *Yukarikopuz*), which is in distric of Eleşkirt, Ağrı, the present paper after giving general background aspects about changing of Kurdish placenames in Turkey, provide a linguistic approach to local microtoponyms and attempt to give description of several collected names which can be evaluated as geographical terms in the Kurmanji Kurdish.

**Keywords:** placenames; microtoponymy; Kurmanji Kurdish; language policy; Yukarı Kopuz; Eleşkirt.

## Destpêk

Mirovan ji demên kevnare heta nika, ji gund û mezrayan heta bajarên mezin, warê ku tê de jiyane li gorî çand, taybetmendiyên fîzîkî û tîkîliyên sosyo-kulturî bi nav kirine û di nav warê xwe de qadeke jiyane ya ku erf û adet, bûyerên dîrokî, dîroka devkî pêk anîne; derûdora xwe li gorî daxwaz û zimanê xwe, ji bo tespîtkirina hêsan ya deveran û ji bo ragihandinê kifş kirine û navandine. Binavkirin, taybetmendiyeke sereke ya mirovan e, ji ber ku bo ragihandin, nasyarî û pênasakirinê, mirovan ji hemû pêkhatiyên dinyayê re li gorî fehma xwe navek dîtîye û ew bi hev û din re dane nasandin. Binavkirina bajar, gund û deverên biçûktir jî dîsa ji ber pêwîstiya tabî ya mirovan tê. Qada zanistê ya ku navên gund û bajaran dikole toponomî ye. Toponomî, di nivê sed sala 19an û vir de bala pir vekolera kîşandîye û ji pir aliyan ve ev zanist hatiye nixandî, senifandin û sepandin. Toponomî qadeke zanistî ye ku xebatên li ser navên erdnîgarî di nav xwe de dihewîne. Ji aliyê bikaranîna wê ya nûjen û sepandina wê ya navên erdnîgarî ve, toponomî babetên balkêş ên wekî ziman, erdnîgarî û nasnameyê digire nav xwe û hemûyan li gorî pêwenda dîrokî, çandî û polîtîk ya dinyaya modern bi cih dike.<sup>2</sup> Her çî qas qada sereke ya toponomîyê cografya be jî, tîkîliyên wê bi derûnnasî, dîn, polîtîka, folklor, zimannasî, dîrok û çend dîsîplînên din re heye.<sup>3</sup>

Onomastîk (*Onomastics*) a ku toponomî wekî binbeşekê tê de bi cih digire, zanista kok, dîrok û bikaranîna serenavan e.<sup>4</sup> Wergiriyeke mezin ya qada

2 Paul, Woodman, *The Great Toponymic Divide: Reflections on the definition and usage of endonyms and exonyms*, Bernardium Publishing House, Warsaw, 2012, r. 5.

3 John Algeo & Katie Algeor, "Onomastics as an Interdisciplinary Study", *Names*, Volume 48, Issue 3-4, 2000, m. 265-274.

4 "onomastics". Random House Webster's Unabridged Dictionary: <http://dictionary.reference.com/>

onomastîkê heye. Mijara me ya sereke toponomî û mîkrotoponomî jî binbeşên onomastîkê ne. Onomastîk hemû cûre navan – navên merivan (w.m., nav, nêvnav, paşnav, bernav), navên cihan (w.m., welat, herêm, bajar, bajarok, gund), navên rûqalê dinyayê (w.m., behr, robar, çem, gol, çiya, girik, gelî, daristan, dehl, şewl, cimcime), navên avahiyên (w.m., xanî, dêr, kolan, bar, dibistan, balafirgeh, otel, rawestgehên rêasinan), navên rêyan (w.m., rê, kolan, şiverê, pir, bihur, co, rêyên gemiyan), navên ajalan (w.m., dilberîk, tajî, hespên berebaziye, dewar), navên etnîsîte û komên civakî (w.m., netewe, eşîr, partiyên siyasî, klûb, klûbên sporê), navên çalakîyan (w.m., pêşbazî, pêşangeh, misabiqe), heyberên astronomîk (w.m., gerstêrk, stêrk), navên navgînan (w.m., balafir, lokomotîv, keştî), navên berhemên ticarî (çîkolate, sorav, şerab), navên berhemên afirineriyê (w.m., pirtûk, film, lîstik, helbest), navên aşopî û navên rasteqîn- bi vî karî liste didome.<sup>5</sup> Onomastîk navan ji aliyê etîmolojî, kultur, ziman û werara dîrokî ve vedikole û pir şaxên onomastîkê (*navnasî*) hene ku ji wan çend hebên sereke ev in:

1. Antroponomî (Anthroponymy) : Zanista navên kesan
2. Toponomî (Toponymy) : Zanista navên cihan
3. Oronomî (Oronymy) : Zanista navên çiyayan
4. Hîdronomî (Hydronymy) : Zanista navên avan
5. Mîkrotoponomî (Microtoponymy): Zanista navên deverên biçûk<sup>6</sup>

Têgehên li jorê ji bo navê zanistan e. Wer wiha, antroponîm; navên kesan, toponîm<sup>7</sup>; navên cih û deran, oronîm; navên çiyayan, hîdronîm; navên avan (çem, behr, gol), mîkrotoponîm; navên deverên biçûk. Mîkrotoponomî û mîkrotoponîm digel toponomî û toponîman pîrr tiştan li zimanê mekanî û erdnîgarî yê derûdora bajarê me zêde dikin. Têkiliya dînamîk û dîyalektîk ya ku navbera tebîet û mirovên ku tê de dijîn, her tim di werarekê de ye, lewma pêdiviya me bi navên toponîm – navên cihên herêmî – heye da ku em xwe li gorî wan nîşan û jêderan araste bikin.<sup>8</sup> Ji vê pêdiviyê, lêkolîn û xebatên curbicur li ser navên erdnîgarî yê dinyayê tên kirin. Cihê mixabîniyê ye ku xebatên toponomiyê li ser gund û bajarên kurdan kêr in.

browse/Onomastics?s=t (08.07.2015)

5 Carole Hough, “What is onomastics?”: <http://onomastics.co.uk/> (08.07.2015)


6 Ji bo ferhenga termên toponomiyê binêrin: Serdar Yavuz-Mustafa Şenel, “Yer Adları Terimleri Sözlüğü”, *Turkish Studies*, 8/8, 2013, r. 2239-2254.

7 Di vê gotarê de li çend cihan wekî pêşniyaz bo **toponîmê cihwarnav** (bi îngilîzî *toponym/plac - name*, bi tirkî *yeradı*) hatiye bikaranîn.

8 Marie Aurélie Thériault, “Ethnolinguistic Investigation Methodology in an Urban Context: Microtoponymic and Toponymic Surveys” (Translation by Henri-Charles Brenner) *International Journal of Humanities and Social Science*, Vol. 2 No. 2 [Special Issue – January 2012]

### Çarçoveya Xebatê, Kereste û Rêbaz

Xebatên toponomîk ne tenê navên gund û bajaran, her wiha navên çiya, deşt, zozan, gelî, şikeft, gir, tax, kanî, rê û şiverêyan jî ji xwe re dike babet. Xebatên bi vî rengî, yên ku bi qadeke biçûktir re mijûl dibin û navên nenasbar yên ku tenê ji aliyê niştecihên wê herêmê ve tên zanîn lê dikolin wekî xebatên mîkrotoponomiyê tên binavkirin. Lewre, wekî ku beşa jorîn de jî derbas bû qada vê zanistê ji qada toponomiyê biçûktir û bertengtir e. Navên ku mîkrotoponomî li ser radiweste, ne navên fermî û berbelav in ku ji aliyê herkesî ve tên zanîn. Ew nehatine tomarkirin û li ser nexşeyan jî bi gelemperî nayên diyar kirin. Ji bo tespîtîkirina wan, pêdivî bi xebatên qadî û bi têkiliyên rasterast yên bi niştecihan re heye. Çimkî hemû navên spesîfîk yên di herêmekê de, di bîra hevpar ya niştecihan de cih digirin û dema ku ji bo nîşankirin û rêdîtînê ji wan re lazim dibe bi awayekî aktîf tên bikaranîn. Navên mîkrotoponomî bêyî ku bên qeydkirin, ji nifşekê derbasî nifşekê din dibin, dibin şahidê bi hezaran merivan, bi bîra civakê de tên stirandin, carinan bi guherînan re rûbirû dimînin.



**NEXŞE 1: Nexşeya parêzgeha Agiriyê û navên navçeyên wê bi kurdî.<sup>9</sup>**

Di vê xebatê de, li ser qadeke spesîfîk em ê lê bixebitin ku bi nimûneyan ve navên kanî, mêrg, çiya û çemên gundê Qopiza Jorîn ku li ser navçeya Zêtkî ya Agiriyê ye, di çarçoveya mîkrotoponomiyê de binirxînin. Çarçoveya xebata me tenê navên şûn û waran in ku piraniya wan tenê ji aliyê gundiyan ve tên bikaranîn û ji aliyê kesên xerîb ve nayên zanîn. Di dema berhevkarîya navan de, hate dîtin

<sup>9</sup> Di xêzkirina herdu nexşeyan de, bo alîkariya wê ya teknîkî, ez spasîyên xwe pêşkêşî N. Nagihan Delikaya dikim.

ku navên ku kesên temendirêj dizanin giş ji aliyê xortan ve nayên zanîn. Wexta ku gund şên bûye, binavkirina şûnwaran heta cihên berteng jî berbelav bûye. Lêbelê piştî ku gundî ji gund koçber bûne navên mêrg û çayîran jî bi xwediyê xwe re çûne. Navên ku me ji bo vê xebatê dan hevdu hê jî ji aliyê gundiyan ve tên zanîn û her çiqas hejmara gundiyan kêm be jî bi awayekî çalak tên bikaranîn. Herwiha, çend termên erdnîgarî yên herêmî wê li gorî çend ferhengên berdest bête şîrovekirin, lewre keresteyên toponomîk û mîkrotoponomîk divê bên vekolîn û xebatên bi vî rengî dikarin bi alîkariya zimannasî û etnolojiyê bên nixandîn.<sup>10</sup> Lewre serenav<sup>11</sup> digel taybetmendiyên zimannasî, pragmatîk, mantiqî, felsefî, semiyotîk, dîrokî, civakî û dadweriyê îşaretên kompleks in û ji ber vê jî qadeke xebatê ya înterdîsîplînî dinimîne.<sup>12</sup>

### **Rûxandina Bîra Civakî an jî Guhertina Navên Gundan**

Di sedsala dawî de, valakirin û hilweşandina gundên kurdan, koça bi darê zorê ya sedhezaran, navên hin şûn û waran hetahetaîyî da winda kirin û hin nav bi temamî ji ferhenga kurdî derketin. Lewre koça mirovan an jî li derekê guherîna demografîk, bivê-nevê bi xwe re guhertinên toponomîk jî tîne. Koçberî, digel 'erf û adetan, bi xwe re nav û nîşaneyên erdnîgarî yên xusûsî jî dibe û tehrîbatên mezin li ser civakê çêdike. Zordariyên bi sistematîk, bi taybetî salên 80yî û 90î ku di pratîkê de wekî hilweşandin û valakirina gundan ya bi darê zorê, kurd ji warên wan ên qedîm ajotîne ber metropolan. Li gorî zanyariyan, hejmara kurdên ku koçber bûne ji milyonekî zêdetir e û herwiha bi hezaran gund jî hatine valakirin.<sup>13</sup> Kurdên ku çend deh sal berê ji ber valakirina gundan koçber bûne êdî navên çayîr, gelî û kaniyên gundên xwe ji bîr kirine. Bîra civakî û mekanî ya her gundekî rûxandî jî bi gund re hilweşiya û hin navên şûn û warên ku nas û binavkirî bûn, bi barkirina mirovan re, navên xwe yên qedîm winda kirin.

Tehribata civakî û çandî ne tenê bi rêya hilweşandina gundan rû daye. Li Tirkîyeyê 12 hezaran zêdetir gund pêrgî guhertina navên xwe yên eslî bûne.<sup>14</sup> Gundên ku navên wan hatine guhertin bi gelemperî navên wan bi kurmançî, zazakî, ermenî, lazî, çerkezî, romî h.w.d., ne. Xeynî ji van, qismêke mezin ya navên bi tirkî jî ji ber hin sebebên keyfî hatine guhertin. Cihên ku herî zêde

10 Marie Aurélie Thériault, Ethnolinguistic Investigation Methodology in an Urban Context: Microtoponymic and Toponymic Surveys (Translation by Henri-Charles Brenner) *International Journal of Humanities and Social Science* Vol. 2 No. 2 [Special Issue – January 2012], r. 266.

11 Hemû toponîm an jî mîkrotoponîm di heman demê de serenav in.

12 Willems, Klaas. "Form, Meaning and Reference in Natural Language: A Phenomenological Account of Proper Names". *Onoma* 35 (2000): 85-119.

13 Dilek Kurban-Mesut Yeğen-Virginie Ladisch-Roger Duthie, *Adaletin Kıyısında: "Zorunlu" Göç Sonrasında Devlet ve Kürtler 5233 sayılı Tazminat Yasası'nın bir Değerlendirmesi-Van Örneği*, (İstanbul: TESEV Yayınları, 2012), r.15.

14 Harun Fırat, "Türkiye'de İsmi Değiştirilen Köyler", *Fırat Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, Cilt:10, Sayı:2, 2000, r.27

pêgî guhertinan hatine Rojhilatê Deryaya Reş û Bakurê Kurdistanê ye.<sup>15</sup> Tenê li bajarê Agiriyê (Qerekilis) hejmara navên gundan yên ku hatine guhertin 379 e. Nişanyan bi kurtasî sedemên guhertina navên gund û bajarên wiha rêz dike:

- a) qutkitina têkiliyên civakî bi rabirdûyê re
- b) têkbirina bandora ziman an jî çanda serdest/zal
- c) avakirina hişmendiya nasnameyeke civakî ya ku zêdetir bi teheyûlên dewletê re li hev tê.<sup>16</sup>

Nav aidîyeta erdnîgariyê, taybetmendiyên herî sereke yên niştecihan nişan didin. Loma guhertina navan li Tirkîyeyê rasterast bi desthilatdariya siyasî re têkildar bûye û ev helwesta siyasî tunekirina navên ji zimanên din, nişaneyên nerazîbûn û bişaftinê ya dewletê aşkera dike. Çimkî kadroyên siyasî yên ku bi vî armancê rabûne, dixwestin gel li gorî bîr û baweriya wan bê terbiyekirin û nasnameya wan li gorî daxwaza dewletê be. Bi van armancan navên ku bi kurmancî û zazakî bûn, hatine guhertin. Bo nimûne li Agiriyê navên çend gundan yên ku peyva *kurd* dihundirînin bi baldarî hatine guhertin;

<b>Navê kurdî</b>	<b>Navê tirkî / fermî</b>	<b>Navçe</b>
Kurdî	Altinkilit	Giyadîn (tr: <i>Diyadin</i> )
Kurdalya	Türkeli	Zêtkâ (tr: <i>Eleşkirt</i> )
Kurdegaz	Örendik	Panos (tr: <i>Patnos</i> )
Kurdikan	Boyalan	Giyadîn (tr: <i>Diyadin</i> ) <sup>17</sup>

Kurdaliya, gundê navçeya Zêtkâ, piştî ku navê wê hatiye guhertin bûye *Türkeli*. Ev mînaka balkêş di rastiya xwe de, ji guhertina navan zêdetir tiştan aşkera dike. Guherîn ji kurdûnê ber bi tirkûnê ye û *Türkeli* di zimanê tirkî de tê wateya *warê tirkan*. Wekî ku tê dîtin, dema ku navên gundan hatine guhertin, carinan wateya navê xwemalî bi tu rengî nehatiye nimandin, tew bi ser de jî wateyeke berevajî lê hatiye barkirin. Navên berbelav û nasyar yên ku ji aliyê herkesî ve tên zanîn hatiye qedexekirin lêbelê jinavbirina navên xwemalî ne hêsan e, heta ku gel bi dilxwazî neguherîne nav wekî xwe dimînin û hebûna xwe diparêzin. Nika ji ber vî sedemê li herderê Kurdistanê piraniya gundan xwediyê du navan e; navê fermî, navê resen. Di mînaka Tirkîyeyê de navên fermî bi gelemperî ew nav in ku dewletê piştî nav-guhertinê daye gund.

15 Sevan Nişanyan, *Hayali Coğrafyalar: Cumhuriyet Döneminde Türkiye’de Değiştirilen Yeradları*, İstanbul: TESEV Yayınları, 2011, r.53.

16 Sevan Nişanyan, *h.b.*, r.29.

17 Nihat Öner, *Ağrı’da İçinde Kürt Kelimesi Olan Yer Adları*: <http://www.avrupahalkinsesi.com/haber/10885/agrida-icinde-kurt-kelimesi-olan-yer-adlari.html> (10.07.2015)

Herwiha, navên hemû gundên kurdan ne bi kurdî ye. Ji radirdûyê, ji gelê cînar û ji demên kevnare nav hatine wergirtin û ev tiştê normal e. Lewre li perçeyên din ên dinyayê jî carinan nav xwediyên kokên têkilhev in; hinekên wan hatine veguhastin, hinek hatine wergirtin (*deynkirin*) û piraniya wan jî nûpeyvên pênasîner in.<sup>18</sup> Navên fermî, encama îrade û politikayên hişber in û di heman demê de biryarên siyasî ne. Lêbelê navên ne-fermî navên tabî'î ne, bi rengekî jixweber derketine holê. Navên ne-fermî li gorî daxwazên desthilatan teşe negirtine, carinan navên henekî û qerfî ne û nakevin ber devê qeyd û bendên fermiyetê.

Bêguman di guhertina navên gundan de helwesteke politîk û desthilatdar heye û ji xwe navên ku li Kurdistanê jî hatine guhertin wekî encama sîyaseta netewperweriyê pêk hatiye. Divê bê bibîrxistin ku nav-guhertin wekî helwesteke siyasî li deverên curbicur ên dinyayê piştî guherînên desthilatdaran rû daye ango ev yeka ne tenê li ser erdnîgariya me rû daye. Azaryahu derbarê siyasîbûna ve-navandinê de dibêje ku “hêla siyasî ya operasyona ji nû ve binavkirinê hem fikrên siyasî hem jî prosedurên biryarderiyê dihewîne ku prosesa muhtemel kontrol dike û bi rê ve dibe.”<sup>19</sup>

### **Giringiya Toponomîk ya Navên Erdnîgarî**

Navên toponomîk nîşaneyên zimanî yên kevn in ku derheqê çand, ziman, têgihiştina gelekî de melûmatan didin. Ji aliyê dîrokî ve jî fonksiyoneke navên gund û deveran heye. Mirov zû bi zû navên bajarên xwe naguherînin. Navên ku li bajaran tên kirin, wekî nexşên keviran mayinde ne. Eger bi temamî gundek neyê qirkirin û koçberkirin, nav jî ji holê ranabe. Navê bajarekî hin caran bi sed hezar salan li bajar dimîne û berdewamiya çandî û zimanî ya mîrata mirovahiyê re dibe delîl. Wekî me li jorê jî got, giringiyeke navan ya politîk û kulturî jî heye ku carinan ji ber van sedeman ji aliyên dewletên desthilatdar an jî bi guherîna hikumetan ve navên gund û bajaran jî tên guhertin. Ev guhertin, ji ber giringiya navên gund û bajaran e. Çimkî nav nasname, dîrok û hebûna civakê li cihêkî dide peyitandin. Lewma, dema ku dewlet qesta guhertina nasnameya derekê dike, bi navê wê derê ve dest pê dike. Bi demê re ‘wate’ bi têkildarê nasname û çanda civakê, li nav zêde dibe û bi vî rengî carinan li gorî helwest û daxwazên dîrokî navê bajarekî ji etnîsîteyê heta yeka din diguhere. Ji xwe îroro di civaka Tirkîyeyê de jî dema ku navê kevn ê bajarekî tê bikaranîn, ji aliyê pir kesan ve ev wekî helwesteke politîk û nasnameyî tê nirxandin ku di rastiya xwe de wisa ne jî. Wekî ku tê zanîn navên mirovan bandorê li ser mirov dike, bi wî rengî jî

18 Bright, William. “What IS a Name? Reflections on Onomastics”. *Language and linguistics*. Institute of Linguistics, Taiwan, China: Academia Sinica, 2003. n. 4.4:669-681. Bi rêya vê linkê: [http://www.ling.sinica.edu.tw/files/publication/j2003\\_4\\_01\\_3698.pdf](http://www.ling.sinica.edu.tw/files/publication/j2003_4_01_3698.pdf)

19 Maoz, Azaryahu, German Reunification and the Politics of Street Names: The case of EastBerlin, *Political Geography*, Vol. 16, No: 6, 1997, rn. 480



navên bajarên derbarê çand û aidiyeta wî gundî/bajarî de agahiyan berpêş dike û bandora wê li ser gel û têgihiştina aidiyetê ya gel heye.

Xebatên toponomîk carinan ji bo gelên koçber û windabûyî an jî derbarê zimanê vî gelî de melumatan dide mirov. Derbarê giringiya navan ji vê bergehê, Taylor dibêje: “Xebata li ser navên herêmî dikare parçeyêke mezin a dîroka welatekî ji nû ve ava bike, komên koçberan dibe ku zimanê xwe yê zikmakî winda kiribin û dev ji hemû taybetmendiyên xwe yê neteweyî berdabin, lêbelê navên ku wan bi hatina xwe ve li warên xwe kiriye wekî qeydeke herheyî ya xwezayê li ser warên xwe yê xwemalî dimîne.”<sup>20</sup> Hemû cihwarên ku mirov lê dijîn –çi toponomîk çi jî mikrotoponomîk– jiber hewcedariyên cihêreng hatine binavkirin lêbelê binavkirina cihwarên biçûk ên wekî çem, mil, newal, çayîr bêtir cihê ecêbmayînê ne lewre desthilatdarî qasî ku bi navên muhim û makrotoponomîk re mijûl dibe bi wan re mijûl nabe. Bi vî awayî, cihwarnavên bi vî rengî eger gelê niştecih ji cih û warê xwe nebibe xwe dikarin zêdetir biparêzin û taybetmendî û zanyariyên ku heta îroroj anîne berpêş bikin. Lewma ev navên cihûwaran ên berteng yê ku em wekî mikro-toponîm bi nav dikin, pêkhatiyên bîra civakî û dîroka erdnîgarê bi hebûna xwe ya sedsalan ve dinimînin û derbarê rabirdûya erdnîgar û ziman de agahiyan berçav dikin. Meinig derbarê vê yekê de dibêje ku “hebûna van navan bi zelalî erdên koma etnîk diyar dike û derbirîna herî girîng ya nasnameya neteweyî ye. Bikaranîna toponomiya neteweyî berdewamiya dîrokî, parastina edetên çandî yê milletekî misoger dike [...] Toponomiya xwemalî ji bo neteweyên bêdewlet ên biçûk wateyên taybet bi dest dixê çimkî tenê ew navên toponomîk erdên wan ên neteweyî destnîşan dikin.”<sup>21</sup>

## Gundê Qopiza Jorîn

Gundê Qopiza Jorîn<sup>22</sup>, gundekî biçûk yê Elajgirê ye. Elajgir an jî Zêtkâ<sup>23</sup> bi navê xwe yê fermî ve *Eleşkirt* navçeyêke parêzgeha Agiriyê (Qerekilîs/Qerekoseyê) ye. Gund ji berê de bûye warê kurdan. Qopiz navê du gundên ji hev cuda ye ku di navbera wan de nêzî du km mesafe heye. Lewma, dewletê navê ya li jêrê daniye Aşağıkopuz (*Qopiza Jêrîn*) û a din jî daniye Yukarıkopuz (*Qopiza Jorîn*). Navê ku nika fermî ye ji aliyê niştecihan ve hatine qebûl kirin. Çimkî niştecihên van herdu gundan jî piştî şerê cihanê hatine li wir bi cih bûne. Tê gotin ku navê Qopizê ji berî cimhuriyê jî ji aliyê gel ve dihate bikaranîn. Di belgeyên fermî yê dewletê

20 Isaac Taylor, *Words and Places; or, Etymological Illustrations of History, Ethnology, and Geography* (2th edition, revised and enlarged) London, 1865, r. 29. Bi rêya vî linkê: <https://ia802606.us.archive.org/6/items/wordsandplaceso04taylgoog/wordsandplaceso04taylgoog.pdf>


21 D. W. Meinig, “Symbolic landscapes,” in id., ed., *The interpretation of ordinary landscapes* (New York: Oxford University Press, 1979): 164. vgz. Arseny Saparov, “The Alteration of Place Names and Construction of National Identity in Soviet Armenia”, *Cahiers du Monde Russe*, 44/1, Janvier-mars 2003, r. 179-198.

22 Koordînatên gund wiha ne: 42° 41' 29" Rojhilat, 39° 53' 59" Bakur.

23 Zêtkâ navê navenda navçeyê ye, lêbelê Elajgir hem navê deştê hem jî navê gelemperî yê navçeyê ye.



de, di sala 1928an de navê gund wekî Qopuz ‘Elya (قوپوز عليا) hatiye tomarkirin<sup>24</sup>. Wê demê, di heman qeyda bi navê *Son Teşkilatı Mülkiyede Köylerimiz* de pîr-raniya navên gundên Elajgirê bi kurdî ne. Ji vê yekê jî tê fêmkirin ku navê gund ji aliyê teşeyê ve hinekî guheriye û hê jî wekî xwe tê bikaranîn. Niştecihên berê yên gund ji navçeya Goleyê ya Erdêxanê hatine û li gund bi cih bûne. Kurdên Goleyê navê navçeya xwe li gund kirine û nav danîne *Golaya* an jî *Golya* û navê merzelên ku li pey xwe hiştine ji aliyê gundiyan ve îro jî wekî Merzelê Golya tê zanîn. Piştî revandina jinekê gundî mecbûr dimînin ji gund derkevin û biçin Erzîromê. Nika jî gundî li Erzîromê dirûnin.



**NEXŞE 2: Cihê ku di nexşeyê de bi rengê zer ve hatiye diyarkirin, qada xebatê ye. ©**

Piştî ku niştecihên Golayê ji gund derdikevin û diçin Erzîromê, ji aliyê Qersê çend malbatên Seydoyê xwe li wî warê digirin û di gund de bi cih dibin. Erdê gund ji dewletê tê kirîn û xêncî çend malbatên ku ji berê de li gund bûne, yê ku nû tîn li wir bi cih dibin. Kurdên ku ji aliyê Qersê tîn, ji eşîra kurdikan in û wekî binbeşeke vê eşîrê xwe wekî seydoyê an jî seydoyan bi nav dikin. Xêncî wan di gund de, malbatên ji eşîra Berazî jî hene. Wexta ku seydoyê bi komî tîn gund û bi cih dibin navê gund demeke kurt wekî Seydoya hatiye nasîn û di çavkaniyan de jî hatiye tomarkirin.<sup>25</sup> Herwiha, Qopîza Jêrîn jî berê wekî Çaçana(n) hatiye nasîn lê êdî di jiyana rojane de ev herdu nav jî ne li kar in. Berê du mezrayên

24 Dahiliye Vekâleti, *Son Teşkilatı Mülkiyede Köylerimiz*, Cilt 1 ve 2. Amadekar: Yer Adları Komisyonu. Dahiliye Vekâleti Yay. Seri: 3, 1928, Ankara. (Bi herfên osmanî)

25 Sevan Nişanyan, *Index-Anatolicus, Türkiye Yerleşim Birimleri Envanteri*, “Yukankopuz”, <http://www.nisanyanmap.com> (20.07.2015)

gund yê bi navê Xanê û Çelê hebûn. Vêga tenê Xan(ê) li ser gundê Qopiza Jorîn ve ye, Çelê bi Melesilêmanê ve hatiye girêdan.

Gundî piştî salên 80yî ji ber sedemên cihêreng koçber dibin. Qismeke mezin ya gundiyan diçin Ewropayê welatên wekî Frensa, Almanya, Hollanda, Belçîkayê, yê ku naçin derveyê welat bi gelemperî li Stenbolê bi cih dibin. Bi vî rengî heta salên 2000î tenê 6-7 mal li gund dimînin û bi çandinî û ajalvaniyê re mijûl dibin. Zimanê serdest ên gundiyan kurdiya kurmancî ye û di gund de kesên ku kurmancî nizanibin tune ye.



**WÊNE 3: Ji aliyê bakur ve Çiyayê Kosedaxê, Qopiza Jorîn  
[©Ömer Delikaya, 2012]**

### **Termên Erdnîgarî û Çandinî yê Herêmî Di Gundê Qopizê de**

Mîkrotoponîm li gorî taybetmendiyên fîzîkî an jî pênasîner yê derekî tên bikaranîn. Loma, hin mîkrotoponîm, termên erdnîgarî yê ku li wê herêmê li kar in, destnîşan dikin. Ji ber vê yekê bo ferhengên termên erdnîgarî mirov dikare sûdê ji mîkrotoponîman werbigire. *Termên erdnîgarî yê herêmî* ji bo navên heyber, şekl û dirûvê cih an jî erdekî tên bikaranîn, ji ber ku qada wan berteng e, carinan hin term tenê ji aliyê niştecihên herêmekî ve tên bikaranîn. Hin termên herêmî jî berbelav in û wekî termên cografyayê ji aliyê axiverên zimanekî ve tên zanîn. Lêkolînên li ser termên erdnîgarî yê herêmî, peyvên bikarbar yê veşartî

derdixin holê û wan li ferhengên zêde dikan. Wekî ku tê zanîn, termên bi vî rengî herî zêde ji aliyê gundî, koçer, şivan û kesên ku bi çandinî û ajalvaniyê re mijûl in, tên xebitandin. Bi vî armancê, li jêrê çend termên erdnîgarî yên ku li gundê Qopiza Jorîn tên bikaranîn, li gorî çend ferhengên hatine ravekirin.

**1. Nizar/e:** Li gorî Ferhenga Zana Farqînî (FZF) 1. cihê ku tav lê nagire, cihê piştero yê bi sî; 2. Bi nexweşî. Li gorî Ferhenga Destî ya Êmîd Demîrhan (FDÛD) 1. cihê ku tav lê nagire; qûze 2. jar. Li gorî Ferhenga J.Blau (FJB) 1. çilmisî, bi nexweşî, zerhimî; 2. cihê tarî.

**2. Bihur:** Li gorî (FDÛD)'yê 1. di cihên teng de şûna ku berteng e 2. Avtenga ku derfeta derbasbûnê dide.

**3. Tengik:** Li gorî (FZF)'ê 1. cihê zêde teng. Ev peyva zêde di ferhangan de cih nagire. Gundî vî peyvê ji bo geliyekî kur û zêde teng bi kar tînin.

**4. Girik:** Li gorî ferhenga bi navê Wîkîferheng (WF), *gir* tê wateya “dera ji derdorên xwe bilindtir lê ne hindî çiyayan bilind yan mezin”.<sup>26</sup> Wekî ku tê zanîn paşpirtika “-ik” peyvan biçûk û şirîn dike. Loma “girik” tê wateya “girê biçûk”.

**5. Şaxa Hesarê:** Şaxeke kur e, berfa wê zaf dereng dihele, ji aliyê piştê ve dikeve nava zikê çiyayê Kosedaxê. Ji ber ku cihêkî zaf asê û bilind e û rê nade wekî “hesar” hatiye binavkirin. Li gorî (FZF) hesar tê wateya “beşa çiyê ya rêgir”.

**6. Şax:** Di gund de cihêkî heye ku jê re *Şaxa* tê gotin. *Şaxa* girekî gilover û mezin e ku xet bi xet tê de newal derbas dibin. Ji ber van newalan şax-şaxî bûye û jê re tê gotin *Şaxa*. Li gorî (FZF) şax tê wateya “newala biçûk a di çiyê de”. Heman peyv ji ber taybetmendiyên wê yên fîzîkî ji Kosedaxê re jî tê gotin. Her wiha gotineke folklorîk de peyva şax bi heman wateyê de hatiye bikaranîn:

“Kosedax şax bi şax e  
Min jê diçinî cax e.”


**7. Text:** Ev peyva di gund de ji bo çend cihan tê bikaranîn. Di Ferhenga Zana Farqînî de (FZF) wateya dehan ya peyvê wiha hatiye ravekirin: “rasta ku cihêkî çiyayî ye”. Cihê ku wekî *Textê Qirawêl* tê bi navkirin, rasterast binetara çiyayê Kosedaxê de cih digire û li gorî derdora xwe bilind e. Ji ber vî taybetmendiyê xwe wiha hatiye binavkirin. Her wiha qirawêl jî tê wateya *zêrewan* û *nobedar*.

**8. Tîr:** Di gund de, cihêkî bi navê *Tîra Gola* heye. Di (FZF) de, bi wateya xwe ya pêncemîn de bi tirkî<sup>27</sup> wiha hatiye ravekirin: “zeviya zirav û dirêj”. Di gund de cihê ku wekî *Tîra Gola* hatiye binavkirin, cihêkî berpala e û di navbera du

26 *Wikîferheng*, “girik”, <https://ku.wiktionary.org/wiki/gir> (27.07.2015)

27 Me şirovekirina peyvê ya ku di ferhengê de bi tirkî ye wergerand kurdî.

kendala de maye û zirav û dirêj e. Ji ber ku wekî tîrê zirav û dirêj e wiha hatiye navandin.



**WÊNE 4: Ev grafîk hejmara navên mîkrotonîm û dabeşkirina wan nîşan dide.<sup>28</sup>**

### Encam

Navên cih û waran ên li ser erdnîgarê, têkiliya kevnare ya erd û mirovan destnîşan dikin. Dema ku mirov navekî li warekî dikin, taybetmendiyên sereke yê wê derê li ber çavên xwe digirin û li gorî erf û adetên xwe û têgihîştina xwe ya di derbarê şeklê erdê de nav li cih û waran dikin. Navên gund û bajarên, nexşên qedîm in ku carinan agahiyên derbarê zimannasî û dîroke de berpêş dikin.

Di sedsala dawî de, navên gund û bajarên kurdan hatine guhertin û nav û nîşanên ku kurdan li ser cih û warê xwe kiriye pêde pêde tîr jibîrkirin. Vê xebata biçûk de, lê hat xebitîn ku bi mînakê gundê Qopîza Jorîn ve, navên ku li gelî, kanî, zinar, kevir, cihwar û cihnişînan hatine kirin bîr tomarkirin û nirxandin. Di vê xebatê de hate dîtin ku gundekî biçûk de, di gel bi dehan navên ku ji ber valabûna gund hatine jibîrkirin, hê jî navê gelî, newal, çem û kaniyên sereke li kar in. Pîrraniya navan xwediyê dîrokeke kevn in û serpêhatî û taybetmendiyên zimanî yê gel nîşan didin. Loma tomarkirina navên toponomîk an jî mîkroponomîk li warekî çand û zimanê gelekî destnîşan dike. Hêviya me ew e ku ev xebata berdest di qada xwe de bibe nimûneyeke biçûk û bikêr.

<sup>28</sup> Ev dabeşkirineke serveyî ye carinan navek dikare bikeve du beşan.

**Pêvek:****Cihwarnavên ku li Gundê Qopiza Jorîn hatine tomarkirin:**

Bilindahî	Cihwar	Cihnişîn	Rast/Best	Av
Fironeka	Newala Gulê	Gomik	Gera Xiznê	Kaniya Sar
Kosedaxê	Kevirê Sor	Gapira	Gera Berana	Kaniya Genî
Sordanî	Newala Kerê	Qopiza	Xozana	Kaniya
Textê Zibarê	Xişika (Xişrek)	Jêrîn	Biruka	Xişika
Topa Kurrê	Kevirê Zer	Xan(ê)	Mexelê Evdî	Kaniya Sar
Topa Qumê	Kevirê Kuze	Çel(ê)	Çîma	Kaniya Girik
Berojê Qow	Newala Hubrê	Çatkosedax	Çawura Bizina	Kaniya
Textê Qerewil	Guhura Aqo	Kewrgewrk	Dendene	Çadirê
Şepa Îso	Kaşê Soyê	Holika	Çawurê Feqîr	Kaniya
Kuzê Qeyaxa	Tîra Gola		Textê Seyîd	Nizarê
Zivrik	Gola Biya Zer		Rasta Palaxê	Kaniya
Textê Qulî	Lena Hurçê		Ada Gola	Gomê
Zewiya Hêsyê	Gola Gola		Beqa	Kaniya Çiri
Geliyê Merxa	Şaxa Hesarê		Gera Sîrim	Çemê Mezin
Topa Kurê	Kevirê		Gera Gewrikê	Çemê Piçûk
Girê Zeynevê	Bindarûkê		Jerika	
Şaxa	Mexelê H. Eliyê		Ada Kitê	
Çawura Çiyê	Seydo		Merzelê Golya	
Şaxa Çiqena	Kirdasî		Daîreya Selîm	
Alênc	Kendala		Çawûş	
Girik	Nehpart			
(Girbişkul)	Nizare			
Çengel	Kelereş			
Şaxa Ga	Avşêlî			
Şaxa Hamê	Gola			
Parçê Onbaşî	Kaxê			
Şarîban	Tengik			
Delîqeya	Newala Kerê			
	Nekiş			
	Dêma			
	Newala Hubrê			
	Kaxa Mala Apo			
	Kevirê Zer			
	Yuzbaşî			

**Kurteyên ku di Vê Xebatê de Hatine Bikaranîn:****FZF:** Ferhenga Zana Farqînî**FDÛD:** Ferhenga Destî ya Ûmîd Demîrhan**FJB:** Ferhenga J. Blau**WF:** Wikîferheng**Çavkanî:**

Algeo, John & Algeor, Katie, “Onomastics as an Interdisciplinary Study”,  
*Names*, Volume 48, Issue 3-4, 2000, rn. 265-274.

Azaryahu, Maoz, “German Reunification and the Politics of Street Names: The  
case of East Berlin”, *Political Geography*, Vol. 16, No: 6, 1997, rn. 479-493.

Blau, J., *Kürtçe-Türkçe-Fransızca-İngilizce Sözlük*, Sosyal Yayınlar, İstanbul,  
1991.

Bright, William. “What IS a Name? Reflections on Onomastics”. *Language  
and linguistics*. Institute of Linguistics, Taiwan, China: Academia Sinica,  
2003. n. 4.4:669-681. Bi rêya vê linkê: [http://www.ling.sinica.edu.tw/files/  
publication/j2003\\_4\\_01\\_3698.pdf](http://www.ling.sinica.edu.tw/files/publication/j2003_4_01_3698.pdf)

Dahiliye Vekâleti, *Son Teşkilatı Mülkiyede Köylerimiz*, Cilt 1 ve 2. Amadekar:  
Yer Adları Komisyonu. Dahiliye Vekâleti Yay. Seri: 3, 1928, Ankara. (Bi  
herfên osmanî)

Demîrhan, Umîd, *Ferhenga Destî kurdî bi kurdî*, Sewad, Çapa Duyem a  
Berfirehkirî, Agirî, 2007.

Harun Fırat, “Türkiye’de İsmi Değiştirilen Köyler”, *Fırat Üniversitesi Sosyal  
Bilimler Dergisi*, Cilt:10, Sayı:2, 2000.

Îzolî, D., *Ferheng Kurdî-Tirkî Türkçe-Kürtçe*, Weşanên Deng, Çapa  
Pêncemîn,, Amed, 2007.

Kurban û yên din, *Adaletin Kıyısında: “Zorunlu” Göç Sonrasında Devlet ve  
Kürtler 5233 sayılı Tazminat Yasası’nın bir Değerlendirmesi-Van Örneği*,  
(İstanbul: TESEV Yayınları, 2012)

Nişanyan, Sevan, *Hayali Coğrafyalar: Cumhuriyet Döneminde Türkiye’de  
Değiştirilen Yer Adları*, İstanbul: TESEV Yayınları, 2011.

\_\_\_\_\_, *Index-Anatolicus, Türkiye Yerleşim Birimleri Envanteri*,  
“Yukarıkopuz”, <http://www.nisanyanmap.com> (20.07.2015)

“Onomastics”. Random House Webster’s Unabridged Dictionary: [http://  
dictionary.reference.com/browse/Onomastics?s=t](http://dictionary.reference.com/browse/Onomastics?s=t) (08.07.2015)

Öner, Nihat, *Ağrı’da İçinde Kürt Kelimesi Olan Yer Adları*: <http://www>.

avrupahalkinsesi.com/haber/10885/agrida-icinde-kurt-kelimesi-olan-yer-adlari.html (10.07.2015)

- Paul, Woodman (ed.) *The Great Toponymic Divide: Reflections on the definition and usage of endonyms and exonyms*, Bernardium publishing house, Warsaw, 2012.
- Saparov, Arseny, "The Alteration of Place Names and Construction of National Identity in Soviet Armenia", *Cahiers du Monde Russe*, 44/1, Janvier-mars 2003, p. 179-198.
- Thériault, Marie Aurélie, "Ethnolinguistic Investigation Methodology in an Urban Context: Microtoponymic and Toponymic Surveys" (Translation by Henri-Charles Brenner) *International Journal of Humanities and Social Science Vol. 2 No. 2 [Special Issue – January 2012]*.
- Willems, Klaas. "Form, Meaning and Reference in Natural Language: A Phenomenological Account of Proper Names". *Onoma* 35 (2000): 85-119.
- Yavuz, Serdar & Şenel, Mustafa, "Yer Adları Terimleri Sözlüğü", *Turkish Studies*, 8/8, 2013, r. 2239-2254.
- Zana, Farqînî, *Ferhenga Kurdî-Tirkî*, Weşanên Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Çapa Sêyem, Stenbol, 2010.